



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .

Ji weşanên Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê - **YEKÎTÎ**
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar (84)

Sibat

2009 z-2620 k

Buha (15) ps

21ê Sibatê

"Roja Cîhanî Ya Zimanê Zikmakî"

Li gora belge û serhijmarên rêxistina Çand, Zanist û Perwerdeyê a Netewên Yekbûyî(UNESCO), bêtirî 6000 ziman li ser rûçkê zemînê dijîn, lê mixabin, ku ji ber sedem û egerên cuda, nîvê van zimanan ber bi pişaftin û windabûnê ve diçin.

Bê goman e, ku her zimanek, zanist, çand, huner û dîroka miletê nîşan dide. Bi xebat û kêferata hizerên salan ew sax ma ye. Her zimanek, kîjan dibe bila bibe, ji bo çand, tore û hunera navnetewî seymyan û dewlemendiyeke mezin e, parastin û pêşvebirina wî erk û stubatriyeke mirovayetî ye. Ji bo vê armanca pîroz, roja 21ê Sibata sala 2000î, UNESCO danezanek belav kiriye, têde roja 21ê Sibatê ji her salekê bi navê "Roja Cîhanî Ya Zimanê Zikmakî" destnîşan kirye.

Çima roja 21ê Sibatê hate bijartin?

Roja 21ê Sibata sala 1952an, beriya ku Bengladiş sala 1971ê ji Pakistanê veqete û azadiya xwe ya netewî bidestxîne, wê hingê, zimanê ARDO zimanê fermî yê dewletê li seranserî Pakistanê bû û zimanê

Bengalî bindest û bê maf bû. Xwepêşandaneke ji bo serbestkirin û fermîkirina zimanê Bengalî li DAKA yê ji bal xwendekar û rewşenbîrên Bengal ve çêbû, 5 xwendekarên Bengal di wê çalakiya pîroz de hatin kuştin. Rêzgirtin ji rewanê wan xwendekarên ku wê rojê jiyana xwe ji bo zimanê dayika xwe kirine qurban, ew roj hatiye bi navkirin. De vêca di bîranîna vê roja pîroz û bi nîşan de, ma gelo zimanê me yê Kurdî li Sûriyê di çi rewş û pergale de ye?. Mixabin, ku karbidestên dewletê bi her hawî hewl didin zimanê me ji holê rakin û zimanê Erebi li şûna wî bi cih bikin. Xwendin û nivîsandina bi zimanê me yê zikmakî, weşandina kovar, rojname û pirtûkên pê tene nivîsandin li me qedexe kirine, çand û zargotina gelê me ya dewlemend berbend û kelemçe kirine, li şûna ku xebatkar û çalakvanên zimanê Kurdî xelat bikin, ew wan tewanbar û zindan dikan!! **D.R(10)**



Ji gerdenê stûyê dîrokê morikek wenda bû

Morika gerdenê stûyê dîrokê , stiranbêjê me yê mezin , Baqî Xidirê Hindawî ye . Baqî kî ye ? . Baqî kurê Xidirê Hindawî ye , sala (1913) an .z , li bajarê Kobaniyê ji dayik bû , di maleke koçer de perwerde bû , du jin anîn û ji herdu jinan (12) xort û (8) keç pêda bûn .

Xeysetên wî : Baqî Xidir pir bi hêmin û aram bû , tu kes ji xwe nedêşand û ji tevan hez dikin , stiranbêjê gelê Kurd tev bû , dengê bilind û zelal li ser bû , û dengê wî ta bi (3) km an dûr diçû . Baqî ji meş û bazdanê , ta dawiya temenê xwe hez dikin .

Hunera Baqî Xidir : Wî ji / 16/ saliya xwe ve , dest bi stiranê kir . Stiranên wî yên navdayî , Dewrêşê Evdê , Xezal (Teyar , Ehmed Axayê Mendê) , ' Bêmal " û Xemê Zalim bûn . û ev stiranên jorîn , wî ji devê bavê xwe girtin . Hêjaye bê gotin , ku kebanîya Baqî ya biçûk " Edle Hemam " ew jî dengbêj , û ji maleke dengbêj bû jî . Wê ji Baqî re , hin stiran jî (mîna : Stirana Dilo û Xalo) saz kirine . Herweha kurê wî yê mezin Cemal jî weke bavê xwe distirê .

li 7/2/2009 an z , kat /6.15/ an , li Bajarê Helebê , li taxa Şêx Meqsûd , ev stiranbêjê hêja û giranbuha , piştî /96/ salan ji temenê xwe , û /80/ ê salî ji parastina stiran , kultûr û zimanê Kurdî , çavên xwe girtin û ji nav me barkir . Di wê rojê de , cendeka wî li otombîlê siwar dikin , meriv û hogirên wî pêre bi rê dikevin û dibine Kobaniya bixemgîn . Li ser çema Ferêt , dora /600/ otombîlî , û / 1000/ matorî , ji xelkê me yê Kobaniyê , kal , mêr,jin xort û keçan pêşewaziya wî dikirin . Hemî bi coşeke mezin , girî , şîn û baxên gulên , bi tabûta Baqî re bi rê ketin , berê xwe dan Kobaniyê , di şar û kastînen bajêr re gerandin , ta ku ew û Kobaniya hêja xatirxastina dawiyê ji hev bixwazin . Paşê jî , li goristana bajêr , li nêzikî gundê " Termikê " , bi beşdariya cemawerekî mezin , baskên tevgera Kurdî û rewşenbîran hate veşartin .

Li dawiyê gelek gotinên hêja , di dermafê xeyset û xebatên wî de hatin pêşkêş kirin û bi xemgînî û çavên ziwa xelkê me yê bi rûmet

vegerîn mal . Û wan bi wê coş û çalakiya xwe ya mezin nîşan dan , ku herkesê di ber gelê Kurd de bixebite , tu carî cefayê wî ji bîr nabe , û navê wî wê di hiş û dîrokê de bên kolandin .

" Bi navê komîta rêvebiriya Newrozê û xwendevanên wê , em serê gelê Kurd tev sax dikin û aramiyê ji xwediyar re hêvî dikin "

Biravo Ehmed Tirk...pûnga we da hev , pîroz e*Beşîr Mele*

Bi mamostayetîk pir zirav û bedew,di demek pir nazik û girîng de we deng veda.Bi vê helwesta we ya ciwan a ku ji xwêdan û keda gelê Kurdistan ber û encam girtî ,we mask û perdeya xap û vîlilkên dagîrkeran ji ser riwên wan rakir. Di ber bangên van rojên bi taybet de ku serokwezîrê Tirk Teyib ardogan hewil dide carek dîtir gelê me bi şeweyekî dem lê buhurî bixapîne.Di heman deman de jî bersiva wan kesên xwedê giravî xwe zana û dûrbînên gelê Kurd dibînin, da .Di derbarê TRT6 de ewê bi şabaşî û xweşbînî helewesta Erdoganî şîrove dikir Ehmed Tirk vajî îsbatkir. Partiya civaka gel û rêvebiriya wê, bi vê helewesta gewre,asta xebata tevgera civaka gelê Kurdistan veguhest qadek bilind û firehtir. Li 24 Sibatê weke erdhejînekê bû li bingeha perlemana Komara Tirkan ket,ya ku ji heştê salî de ji rojek wehare xwe amede dike ku neqewime.mîna mar ku ji pûngê çendî direve û jê ditirse ,ev pûnga ku tovê wê ji navbera du çeman resenî girtiye xwe dirêjî qulên marên kevnakirî dike di ode û kuşkên wande ye bixazin yan nexwazin.

Ehmed Tirk baq û gurzê vê pûnga deşt û zozana kurdistanê li gel beybûn û nêrgizên dehl û çîmenan netenê dide ber pozê perlemana Tirkan ,vêre jî dewlet û hêzên ku piştgirîya Tirkan dikin di bînpêkirina mafê gelê Kura û pîrsa mirovatîyê de...



Helbestvanê Kurd ê navdar BÊBUHAR

Koça dawîn bar kir



Berbanga roja
Pêncşembê 15.01.2009
an, dilê helbestvanê
Kurd ê navdar û naskirî
Yûsif Berazî-
(Bêbuhar), piştî
berxwedan û kêferat a

derdora salekê bi nexweşiyê re rawestiya.

Bêbuhar ê helbestvan û mûzîk hez, xwediyê dilê mezin û hestê nazik, ji biçûkaniya xwe ve, bi şîrê dayika xwe re, ji cama çavsorî û zordestiya tîrş û tal bi gelê xwe re vexwariye, Paşê bi wêrekî û mêrxasî wî li dijî sitemkariyê serî hildaye û li gora karîn, zanebûn û baweriyên xwe, bervanî di ber doza gelê xwe ya dadmend û rawa de kiriye, berevanî di ber zimên, tore û zargotina kurdî de kiriye, helbestên xweş û şêrîn ji gelê xwe re afirandine û doza gel li nik wî bûye kul û derdê herî mezin û sereke. Ya ku ji ber wê, gelek caran li zindanan bûye mêvan. Ji ber sitemkariya sedê salan, ku li gelê Kurd li seranserî Kurdistanê bûye, belengazî, xizanî û perîşaniyê konê xwe hawîr vegirtine, Girtin, kuştin û wêrankirin li her çar kenaran belav bûye, Buhara welêt hişk bûye, loma wî navê Bêbuhar li xwe kiriye. Lê, rojekê jî ew bê hêvî ne bûye û ta roja dawiyê ji temenê xwe, xebata xwe ya rewşenbîrî berdewam kiriye, evîna gel û ziman di dilê wî de mestir bûye. Tevî hemî astengên jiyanê, helbestvanê me yê mezin serî ji xizaniyê re ne çimandiyê. Her ew bi doza gelê xwe re girêdayî, rastgo û xwedî bîrbawerî ma ye. Wî di dîwana xwe ya 5an de, ya ku li sala 2007an ji bal dezgeha Sema Kurd ya Çand û Hunerê ve hatiye weşandin, Gotiye:

Çiqas sax bim li dunyayê,

Ji dunyayê ezê rabim.

Herim gorê bi dilpakî,
Li dunya nav nexwenda bim.
Wekî pêxemberê Yezdan
Bi herdunya ezê şa bim.
Riya xwar ez ku wê bigrim,
Herim têra û wenda bim.
Ku xwar navê mi derket ew,
Ketim îdî xelas nabim.
Ku erzan bim li nav xelkê,
Bi dunyayê qe şa nabim.
Ku ez bimrim bi rû reşî,
Ji vir tişkî bi xwer nabim.
Bila bimrim ne sax bim ez,
Li nav xelkê ku erzan bim!!

Axa te xweş be seydayê **Bêbuhar** û cihê te buhuşta rengîn be, serê gelê me, malbata we û toreya kurdî sax be!

15.01.2009

Komîta Kovarên Kurdî Li Sûriyê

Heval Şiyar çû ser dilovaniya xwe

Ji encama rewşa aborî ya herî dijwar û hikariya wê li ser civakê, pir caran mirov û bi taybetî nişên nû, rê li pêş wendadibin û matmayî dimînin, û ew dibe sedema nexwaşyan. Di bin sîpera vê rewşa xerap de, di 23-02-2009 an de, heval Şiyar kurê Mihemed Elî, ji gundê Çê, herêma Kurdaxê, di bûyereke xwekuştinê de, jiyana xwe wenda dike. Bi beşdariya xwedî, berketî û hevalên partiya wî, di goristana gund de binax dibe. Bi navê komîta rêvebir ya Newrozê û xwendevanên wê, em serê xwedî û hemî hevalan sax dikin



8ê Avdarê Li Hemî Jinên Cîhanê Û

Bi taybetî Li Jina Kurd Pîroz Be .

Komîta Kovarên Kurdî Li Sûriyê
Azadî ji Çalakvan û Xebatkarên
Zimanê Kurdî re!

Beyaniya roja Sêşembê 13.01.2009an, dezgeha ewlekariya rêzaniyê (siyasiyê) li bajarê Qamişlê dest daniye ser rewşên bîr û zimanhezanê Kurd Derwêş ê Xalibê Derwêş (1945), ew ji mala wî biriye, paşê ew guhestiye bajarê Heseke û ta niha rewş û çarenûsa wî ne diyar e. Herweha, roja Şemiyê 17.01.2009an, birêz Fewazê Kano (1960), û birêz Zekî Ismaîlê Xelîl (1977) ji bal wê dezgeha ewlekariyê ve hatine girtin.



Sûc û gunehê van hersê nivîskar û rewşên bîrên me yê Kurd ew e, ku ew guhdanê li zimanê dayika xwe dikin, pê dixwînin û dinivîsin, wî didine xwendin û fêrkirin û mîna evîndarên ziman û toreya Kurdî di civakê de hatine naskirin.

Ma gelo guhdana li zimên û toreya Kurdî gunehkarî û tewan e? Ma gelo zimên, tore û zargotina gelê Kurd ne parçeyek ji tore û folklorê netewiya welatê me Sûriyê ye?! Ma gelo parastin û geşkirina zimên û zargotina Kurdî ji çanda mirovatî û ya navnetewî re ne zengînî û dewlemendiye?!.

Bi navê Komîta Kovarên Kurdî li Sûriyê, em dengê xwe bilind dikin û dibêjin:

Azadî û serbestî ji çalakvan û xebatkarên zimanê Kurdî re..!

Azadî ji hemî girtiyên nerîn û derbirînê re..!

Komîta Kovarên Kurdî Li Sûriyê 19.01.2009

Dumahîk: weke mi ewêê

mirovan û çalakvanên civaka sivil, mil li mil, ji bo doza vî gelê reben î perîşan xebatê bikin û têkiliyên dostaniyê bi hêz û partiyên sûriyê re saz bikin û bihûnin. Di nerîna min de, xebat bi vî rengî baş dibe.

P5-ji keç û xortên Kurdan re çi dibêjî mamo?

B5-Gereke ew bi doza gelê xwe mijûl bibin, bê westan kar û xebatê di ber doza wî ya dadmend de bikin, erk û stubarên xwe hilgirin, fêrî xwendin û nivîsandina zimanê dayika xwe bibin û wî bidin xwendin. Ziman, folklor û zargotina Kurdan dewlemend û zengîn e, cihê pesin û serbilindiyê ye. Ez navtêdanê di nifşê nû didim ku ew zend û bendan vemalin, bi mîrxasî barê zimanê xwe hildin ser milan.

Mamo sipas ji te re, em hêviya tundurustiyê saxlem û baş, temenekî dirêj, dûrî nexweşiyê ji te re dikin. Hûn li ser riya xebata Kurdayetiyê nimûnene geş û bi ronak bûn, bi saya xwedê û serê têkoşerên mîna we, îro em li ser vê riyê berdewam dikin. Careke din sipas.

Azadî ji girtiyên Siyasî û xebatkarên gelê me

Yên Kurd re , yê di girtîgehên Sûriyê de

N . " Xemxwarê Welêt

Belkîm hin bipirsin , ka çima ev dirûşma jorîn di hemî weşanên Partiya Yekîtiya ya demokrat a Kurd de li Sûriyê, çî di Yekîtiya yan jî " Newroz " de , carbicar diweşe ? .

Di baweriyaya me de , hildana vê dirûşmê ne ji valahiyê hat , belê ew li ber roniyaya pir rewş , merc û sedemên xweza û nexweza hate ristîn , hildan û bikaranîn . Emê rakirina wê bi vê awayî li jêr ji xwendekarên " Newrozê " re şirove bikin.

Berî hertiştî , wextê her mirovek ji dayka xwe dibe ; Ew bê zor û azad tê ser vê gerdûnê , û tiştêkî xwezayî ku weha jî bijî . Û ne ji mafê tu hêzê ye , ku azadiya wî jê bistîne yan biqoprine . Hêjaye em gotina " Omer İbin Elxetab " di derbareyî azadiya mirovan de bi bîra xwe wînin: " Çawa hûn kanin mirovan kolebikin , û dayikên wan ew azad anîn" .

Li aliyê din çiqas rêxistinên sêvîl û mafên mirovan hene , tevan li ser azadiya siyasî û nêrîna mirovan tekûz kiriye , û ji ber ve dixebitin jî .

Herweha di pir ciyan ji lîsta mafên mirovan de jî , cîyekî bilind standiye . Û destûrên gelek dewlet û civakên şaristanî jî bergeheke mezin dane vê mafê .

Li nik wan tiştên jorîn , em bawerîn

ku çî civak û dewletên di dîrokê de , ku azadî û nêrîna xelkên xwe parastine , û rêzdariya wan girtine ; Ew pêş ve çûne û di dîrokê de jîndar bûne . Ev dewletên Iskendenavî û Ewropî jî , mînakî ronak in .

Bervajî wê jî dewletên ku mirov û xelkên nav xwe civilandine , bînpêkirine , û nêrînen wan di dermafên tevaya pîrsgirêk siyasî jiyana welêt de , bi rêz negirtine ; Ew dewlet paşdemayî mane , bi pêş neketine û şaristan ava nekirine . Piraniya dewletên Ereb û Misilman nimûne ne . Wek tê gotin jî , dewleta ku mirovên xwe ne azad , ew dewlet jî ne azad e . Yanê em bawerîn ku parastina azadiya mirov û mîletan di dewletan de , bi awakî zagonî , nîşana afrandin , pêşketin , hêzbûn û yekbûna wê dewletê ye .

Wêlomê Partiya Yekîtiya ya demokrat a Kurd li Sûriyê , ew dirûşma hildaye û di ber de dixebite , û hercar jî di weşanên xwe de , bi bîra xwendevan , heval , hogir û dostên xwe tîne , û dibêje : Çênabe tu kes bo nêrîn an helwesta xwe ya siyasî were girtin û zîndankirin , û yê di girtîgehên Sûriyê de , ji bo berjewandî û paşerojeke xweş ji vê welatê me tevan re – divê azad bibin û bêne berdan .

Du xebatkarên Kurd

Li bajaroka Amûdê hatin xelatkirin

Roja Yekşembê 08.02.2009an, li 6ê êvarî, birek ji dost, heval û hogiran, xebatkarê Kurd **Behcetê Begê**(Bavê Şino) û buhuştî **Hesenê Lal**(Bavê Dilo) yê ku temenê xwe ji bo doza gelê xwe terxandibû, li Amûdê xelat kirin.

Hin ji dostên beşdar, li ser xebata bê deng û sinciyên herdu xebatkarên bi dirêjî axivîn û dan zanîn ku herdu camêran li gora karîn û zanebûna xwe, di ber vê doza dadmend de xebateke bê westan kirine, li hember zordarî û sitemê serî hildane, bi şeweyên aştiyane û demokrat xebat kirine, destê biratî û dostaniyê ji bo xebata hevbeş dirêjî hemî welatîyên Sûriyê kirine û ji bo avakirina welatekî azad û pejirandina mafên gelê me yê Kurd û rêzgirtina mafê mirovan têkoşîn kirine. Birêz **Behcetê Begê**, gotina dawî

kir, bi rondik û dengekî kelogirî, li ser hevalê xwe yê buhuştî **Hesenê Lal** peyivî û got, ku hevalê wî **Hesen** di şiyarbûn, razan, rabûn û rûniştina wî de, di xebata wî de herdem pêre ye, herweha xebat û bîranînên wî anîn zimên, da zanîn ku ew rojekê li xebat û westana xwe di ber vê dozê de poşman ne bûye. Ji ber ku gelê me hêja ku mirov serê xwe di ber de bide û teqez kir ku her ewê li ser wê riyê ta roja dawî ji temenê xwe berdewam bike. Herweha got ku ew hêz, huner û xwurtiya xwe ji heval, hogir, gel û partiya xwe destine û rojekê çavên wî ji kar û xebatê ne şikestine.

Li dawiyê, birekî ji beşdaran wêneyeke buhuştî **Hesenê Lal** ku di hundirê sembola Partiyê de hatibû çêkirin, li mala wî weke nîşana hevaltî û dilosziyê daleqandin.

Çê kiro bi xwe kiro, Xirab kiro bi xwe kiro

Dilê Kurd

Apê min, Seyid Eliyê Berzençî dilovaniya xwedê lê û li miriyên we be, li gundê Cimayê, nêzikî Qamişlo dijî. Ew mirovekî pir jîr û hişmend bû, ji her karî re digot were û çavên wî nedişkestin, zana û xweşbêj bû, nemaze di ware çîrok û serpêhatiyên de û ew di gotina wan de pêlwan bû. Tê bîra min, carê ez li rex wî rûdiniştim, min guhdariya serpêhatiyên wî dikir. Yek ji wan jî ev bû:

Dibêjin hebû mirovekî xizan û feqîr, ji xwe re digeriya bi tevdîr, li danekê, li parsekê, her wî digot: Çê kiro bi xwe kiro, xirab kiro bi xwe kiro..

Li gundekî, ew li nav malan digeriya, ha ji vir, ha ji wir, çî hindik çî gelek ji xwe re da hev, dît ku waye pîrek li ser tenurê ye, nan lê kiro .. dixê. Yê xizan nanek jê xwest û her wî digot: Çê kiro bi xwe kiro, xirab kiro bi xwe

kiro..

Hingî pîr jê dilteng bû, rabû hinek jehir xiste nanekî û dayê û her yê xizan, piştta xwe da pîrê, bi riya xwe ve çû û her ew gotina xwe dibêje: Çê kiro bi xwe kiro, xirab kiro bi xwe kiro..

Bi rê de, mirovê xizan pêrgî rêwiyekî hat, yê rêwî nanek ji xizan xwest, rabû yê xizan ew nanê ku pîrê dabûyê ji tûrikê xwe derxist û da dest yê rêwî da bixwe. Çî hindik, çî gelek, piştî rêwî nan xwar, zikê wî ariya, hema bi zikê xwe girt û bi riya xwe de çû, bê hal giha mal. Diya wî ya pîr pêve hat, ha kurê min, te xêr e?. wî çîroka xwe û xwarina nanê xizan ji diya xwe re got û çav girtin, Kurê pîrê mir!! Pîrê bi tepan bi serê xwe ket û got: Rast e Çê kiro bi xwe kiro, xirab kiro bi xwe

weke min ew dîtiye

Nûşîn Bêcirmanî

Berî demekê, nûnerê weşana **Newrozê** hevpeyvînek bi Mihemed Emînê Derwêş (B.Egîd) re kiribû, tê de, wî ronî dabû ser destpêka xebata xwe di hundurê tevgera kurdî de li Sûriyê, lê mixabin berî belavkirina wê hevpeyvîne, ew kesayetiya niştimanî û rewşenbîrî çû ber dilovaniya xwedayê xwe. Di 30/10/2008an de, girûpa Dêrikê ya çanda kurdî çilrojîya wî li darxist û nûnerê Newrozê hate vexwendin, di wê çilrojîyê de gotinek xwend. Wî hin nerîn û hilwestên xwe sebareti buhuştî anîbûn zimên. Niha, emê hin ji pirs û bersivên wî ji xwendevanên Newrozê re belav bikin.

Mamê Mihemed Emîn: em xêrhatina te dikin, gelek dilxweş û şa ne ku vê hevpeyvîne bi te re bikin, em sipasya te dikin ku tevî tendurustiya te ya ne baş jî, te sînga xwe ya fireh ji me re vekiriye da em nêçîrê di baxên çalakiyên te de bikin, mamê delal careke din tu bi xêr hatî mêvanê giranbuha .

P1- Mamo, tu karî xwe ji xwendevanan re bidî naskirin?

B1- Belê, ez Mihemed Emînê Derwêş im, ji gundê Şelal, yê nêzîkî Dêrûna Axê ye. Ez ji wir hatime Dêrikê û bi nivîsandina helbesta kurdî mijûl dibim, hin kurte çîrokên min jî hene.

P2-Tu dikarî ji me re destpêka xebata xwe, di tevgera kurdî de bidî xuyakirin ?

B2-Di sala 1957an de, ez li dibistanê bûm, wê salê(Derwêşê Mele Silêman) hate gund û daxwaza civatekê ji xortan re kir û gote min divê tu jî werî civatê .Hingê ez biçûk bûm. Di sala 1958an de, ez

bûme endamekî Partî û Derwêş komikek li gund ji van endaman ava kir : Şerîf ji Dêrûn Kevinkê, Evdo yê Mihema, Tahirê Mihemedê Mele Tahir, şêxoyê



Himêdî û ez. Gote me divê hun ji bo doza kurdî xebatê bikin û hevalan pir bikin. Me wilo berdewam kir ta ku em bûne komîteke (MEHELÎ) û ez bûme berpirsiyarê wê. Partî li devera Aliya tevî belav bû, serokatîyê jî tu nûçe ne didane me. Lê li gora zanebûna xwe, em ji millet re dipeyvîn û me hestê wî yê netewî bilind dikir. Hingî, agirê şoreşa Kurdistana Iraqê geş û bilind bû. Wê demê, mehanê me çaryek Lîreyê sûrî bû. Xelkê ji me dipirsî: Ma ev pere diçine şoreşê ? . Me bersiv bi erêbûnê dida wan . P3-navin ji berpirsiyarên wê demê têne bîra te gelo?.

B3-Belê, ji wan Derwêşê Mele Silêman, Ebdilhemîdê Derwêş, Mihemedê Mele Neyo, Osman Sebrî, Ebdelayê Mele Elî, Xelîl û Hesen jî hebûn .

P4-Tu wek siyasetmedarekî Kevin , çi şîretên te ji partiyên tevgera kurdî li Sûriyê re hene ?

B4-Divê mirov bi gelê xwe re be, jê hîn bibe û wî hîn bike û gerek bê derengî lêvegera kurdî ava bibe. Eger em hemî dest nedin hev û dilan ji hev re venekin, banga xwe nekin yek, dengê gelê me bilind nabe û her emê di vê gerînekê de bimînin. Bila hemî bi hev re, partî, rewşenbîr, saziyên mafên **D.R (4)**

TRT6 Gaveke Erênî ye

Di 01-01-2009 an de, destlata Turkiyê, bi beşdariya serokwezêr R.T. Erdogan Kenala TRT6 bi zimanê Kurdî vekir. Bilî vê jî, ji nih ve, dezgeha perwerdehiya bilind xwe ji vekirina beşên ziman û edebiyeta Kurdî re, di du zanîngehan (Enqere û Stembolê) de amade dîke. Piştî vekirina kenalê, pir guftûgo li ser hatin weşandin, hin neyênî û hin jî erênî bûn. Di bawreyî me de, ku ev gava destlata Turîk, ne ji bo xatirê çavên me yê reş belek in û ne ji xwe berê hatiye, Pir sedemên wê hene.

1- Hikariya serpehatiyên Kurdan yê kevin û nû (Ubêdelah Nehrî – Şêx Seîd Pîranî- Dêrsim- Agirî PKK û h.w.d. 2- Hukariya rewşnebîrên hundir û derve. 3- Hukariya dostên Kurdan yê Tirk. 4- Hikariya dewletên Ewropa ya ji bo çareserkirina doza Kurd .5-ji bo helbijartinên perlemanto û dengên Kurd. Û H.W.D.


Bi rastî gava mirov Pîvanekê di navbera vê biryara destlata Tirk û xwîna bi hezaran şehîd û wêrankirina gundên Kurd bike, Tu carî beramberî hev netên. Û rast e jî di destûra bingehîn de, navê Kurdan nîne û nasnameya wan nehatiye pejirandin. Lê, pirs ne ew e, ka çawa xebat bête kirin ku ev kenal di xizmeta çand, ziman û pîrsa gelê Kurd e, û pexşna vê kenalê bi zimanê Kurdî berdewam be û xebat bibe ku bikev nav xalên destûra bingehîn ya dewletê. Ji ber dewleta turîk xwedî zagone û kar û xebata siyasî, di bin siya hebûna zagonek weha de, pir û pir hesan û rê

Hesenê Cumî li ber kar û xebatê vedike û hêzên siyasî karin hin armancên xwe biqopirînin û bi cî bînin. Zagona dewleta Tirk, ne weke ya destlata partiya Beis e. Sûriya ji 48 sal an ve di bin siya zagonên awerte de dijî. Lewre jî zagone dane ser refan û her dezgehê ji dezgehê dewletê, xwedî zagone serbixwe ye.

Bêguman, weke me li jor gotibû ku, ev biryar ne li gor hebûn û daxwaza gelê me yê Kurd e . Lê, gaveke li ser riya çareserkirina pîrsa Kurd di Turkiyê de ye û li dijî helwestên Kemalîzm e. Lewre jî divê em lê bibin xwedî û pêşve bidin, daku di xizmeta me Kurdan keve.

Ji weşanên nû

" Gulistana Zimên" pirtûkeke fêrbûnê ye, Kurdî- Erebi ye , ji 165 rûpelan qetê navîn, û ji sê beşan hevedudanî pêk hatiye . Beşê yekê Abeya Kurdî ye, beşê diwem rêzimanê Kurdî bi şewekî kurtkirî ye û beşê siyem jî ferhengoke, ji dora 3000 bêjeyên pir bi kar tên e.



Hêjaye em xwendevanên Newrozê agahdar bikin ku, derçûna vê pirtûkê bi erêkirina Şalyara Ragihandinê ye. Dêroka erêkirinê 20-10 û nimra wê jî 2624 e. Em bi Hêvî ne ku, sûd û kêrhatin ji vê pirtûkê were girtin û armanca mamoste Merwan Berekat ji pirtûkê bi cî were.

Kurdistana Sor Yan Perçeyê 5'an

Rêzan Mad

Di kirîza çareserîya pirsgrêka gelê Kurd de, gellek fakterên kêmtên zanîn, û ne tenê di sînore dewletekê de an jî bi netewyekê re girêdayî ye, ji ber ku him fakterên herêmî, him jî Cîhanî hildigire. Yek ji sedemên ku çareseriyê dixê, ev e ku ji ber bûyerên şidet û bazirganiyê her wiha rewşa jêografîk, kurdan jiyana Koçberiyê dimeşand, bi demsalan an jî girêdayî guhertinên hawîrdorê cîh û warê xwe diguhertin.

Di sedsala 16–17'an de li Rojhilatê Kurdistanê hejmarekî Kurd derbazî cihê niha yê Turkmenistanê bûn. Li sedsala 18'an de jî Koçekî zêde li Bakûrê Kurdistanê ji ber zordariya Osmanîyan bi rêya Gilîdaxê ber bi Ermenistanê ve koçber bûne. Rewşa Koçberiyê her dem bi ahengekî bi hawîrdorê re dijîya. Lê şoreşa Bolşevîk 1917-1922'an dema xwe li çarenivîsa gelan xist û ne tenê nehişt sînore jiyane, hemû rengê nû werbigire, ji ber ku bandora xwe di Cîhanê de da hîskirin. Ligel hemû milletên Soviyetê, Kurd jî wek kêmtewekê bû xwediyê wê derfetê ku statûyek fermî werbigire.

Di 16'ê Tîrmeha 1923'an de, Komîteya Navendî a Soviyetê bi înzeya Kîrîov li Karabaxa çiya, herêmek bi navê Kurdistana Sor bi fermî nasî (Bi Payîtexta Laçîn).

Berpirsiyarê Komîteya Navendî a Kurdistanê Hûsû Hacıyof bû. Saziyên perwerdeyî, weşan û çapemenî bi zimanê dayîkê ava bûn. Lê her wek hemû carên din Kurd bûne goriyê siyaseta hundur û derve. Ji ber serhildana Bakûrê Kurdistanê, her wiha têkilî û dengyên navbera Soviyet û Turkiyê, dewletên herêmê ew Kurdistana Serxwe bi xeter û asteng dîtin û piştî 7 salan di 1930'ê de ji

holê rakirin û dawî bi Kurdistana Serbixwe hat.

Di sala 1937-1938'an de, Stalîn operasyonên paqijkirinê dest pê kiriin, sirgûnî û gulebaran rêbazên esasî yê pêkanîna wê bûn. Kurd ji wê demê ligel kêmtewên din sirgûnî Asyaya Navîn hatin kirin. Ligel şerê Cîhanî yê duyemîn ku Soviyetê serkeftin bidest xist, rewşa kurdan li Soviyetê nehat guhertin û di bingeh de hemû

saziyên çandî, perwerdeyî bi zimanê dayîkê hatin qedexekirin. Yanî nasîna Neteweya Kurd fermî nebû.

Car din, dawîya salên 80' ê û destpêka salên 90'î de ku Soviyet ber bi têkçûyîna ve diçû, pîrsa Kurdan car din

bi awayekî germ derket holê, bi taybet ji nû ve dane naskirina Kurdistana SOR. Bi vê yekê saziyên mezin wek YEKBÛN ku hemû Kurdên Soviyetê di nava xwe de hildigirt, di bin rêberîya Wekîl Mûstefayof de mijûl dibû.

Cûda cûda hewldan pêşketin, bi meş, name û mîtingan ku dixwestin vê pîrsê car din bidin diyarkirin. Heta

ji M.S. Gorbaçof re ku Serokê Soviyetê bû ev yek dane diyarkirin.

Di Mayîsa sala 1991'an Gorbaçov vê hewldana ji nû ve avakirina Kurdistana SOR destek dike û silavê xwe ji Kurdan re dişîne. Em dizanin ku di dawîya sala 1991'an de, bi fermî dawî li Împîratoriyeta Cîhanî a Soviyetê hat. Lê Kurdan xebatên xwe ranewestandin.

Tê zanîn di şerê Azerî û Ermenîyan de, li Herêmê kavilkarî û texrîbatên mezin çêbûn. Herwiha di herdu milan

de jî Kurdan di şer de cihê xwe girtin, yanî şerê birakujiyê jî bû qismet û nesîba Kurdan. Yanî bi dara zorê ji D.R(11)

Her tişt di wextê de xweş e!

Enehîte Morad

Di dîrok û kiltûra miletan de , pir çêrok û bûyerên cure-cure yên bi êş û jan di warê evînê de hene . Bêguman gelê Kurd jî di vê warê de pir dewlemend û zengîne . Bi dehan keç û jinên evîndar, zor û setem ji ber evîna xwe ve dîtine. Gerdîşên civakî yên pûç û vala , ew ên ku di hiş û ramanê me de pal vedane , em ji hestê mirovanî bi dûr xistine û bi bêbextî em pir jin dane kuştin, yên di jî bi hêsanî ew avêtine jiyana nakokî , ew ji hemû mafên mirovan bêparkirine. Vêca jî, ta roja me îro, jin di derya êş û serpêhatiyan de li ber xwe dide . Ma gelo kî nizane ku ji hestê evînê xweştir tiştêk nîne , lê zor mixabin di bin perda navê evînê de salê bi dehan jin û keçên ciwan nemaze nifşên nûguha têne xopandin . Li encama wê yekê , rûdawên bive di civaka me de serî hildane û bihayê wê jin û keçên reben didin . Di bin perda şuştina şeref û namûsê de , kuştin ,lêdan di civaka me de berdewam e , bê ku em karibin mêr û xortan sûcdar bibînin ! .

Bese! Dem hatiye , pêwîste ku em xwe ji sîstema bavê rêzgar bikin , wekiheviya mêr û jinan di her warekî de bipejirînin , ta ku em karibin heyameke tenduristî dîrî kuştin û setemkariyê di civaka Kurd de ava bikin . Her wisan jî, zor girînge ku, em li nifşên nûguha ji keç û xortan xwedî derkevin û wan li ser riya wekhevî , dademendî bawerî perwerde bikin. Kesatiyeke rast û durist di hundir wan de ava bikin . Belkîm , bi vê awî em karibin , keç û xortên xwe, wan bi dilovanî hembêz bikin . Têkilî bi wan re, li ser riya rêzgirtin , bawerî û evînê , ne jî li ser bingeheke tirsê û kotekan ew perwrde û tomar bibin . Çi pêwîste ku,

zarokên me dê û bavên xwe li pêş xwe mezin û weke şêwrmendan bibînin . Ne jî weke hurç û hovan, ji wan bipelikînin û bazdin , herweha hestekî biyanî, di navbera xwedî û zarokan de ava bibe .

Bi boneya Cejna evînê, di -14-ê sibata -2009-an de, ji hêla rêxistina jinan ve ya Parta Yekîtiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê –Yekîtiya Komcivînek li bajarê Helebê hate lidarxistin , kesên beşdar - 25-kes ji keç û jinên dilsoz bûn , pir têbînên balkêş digel gilî û gazinan pêşkêş dibûn , daxwez û hêviyên wan beşdaran bi tevgera siyasî bilind dibûn . Çi qas girînge li civaka me kurdan , tevgera siyasî xwedî derkeve û komcivînen ji vê rengî lidarxîne . Li dawî bi çepik , sitiran ,sema û reqis û pêxistina mûman , digel xelatkirina beşdaran komcivînan bi serî dibû . Em jî bi navê xwe û komîta Newrozê hemû keç û xortên gelê Kurd pîroz dikin, serkeftin û rojên xweş ji tevan re hêvî dikin .

Dumahîk : 21ê Sibata

Lê, di dîroka gelê me yê Kurd de, gelek biryar û kiryarên windakirina vî gelî û zimanê wî hatine dan, li dawiyê, xwedanê wan biryaran çûne û gelê me li ser lingên xwe maye, zimanê xwe parastîye, ango, zimanek mîna zimanê Kurdî ku îro derdora 40 milyon mirov wî di jiyane xwe ya rojane de bikar tînin, tu carî ew bi biryarên qedexekirinê ji holê ranabe.

Eger dereng be jî, pêwîste karbidestên dewletê li biryarên xwe vegerin, bi hişmendî û berpirsiyarî têkiliyê bi vê pirsê re bikin, zimanê Kurdî mîna zimanekî fermî niştimanî bipejirînin û ji bo pêşvebirina wî defetan bibînin û ji ber biryar û kiryarên xwe yên ne mirovane yên dij hebûna gelê me û zimanê wî yê pîroz lêborînê bixwazin!

Rêberê Silîvî

Dumahîk : Kurdistana Sor

bo Axa biyanîyan berdidan canê hev û şer dikirin. Me berê jî dabû zanîn, li gor dûzena kevin, Kurdistana SOR di axa Azeriya de bû, lê di vê dema şer li 17'ê Gulana 92'an de paytext Laçîn dikeve destê Ermeniyên, her wisa ligel wê bajarên din yê di Kurdistana SOR de cihê xwe digirin weke Kelbecer, Kûbatlî, Zengîlan.

Heya Cotmeha 93'an dikevin bin desthilata Ermeniyên. Piştî ku Heremên Kurdistana Sor bi taybet Laçîn dikeve bin çavdêriya Ermeniya, nêzîkbûn û dostaniya Ermeniya tevî Kurdan taybetî li Soviyetê li nav hemû saziyên gelerî û ...hwd li Emenîstanê pêşketin. Wê demê Wekîl Mûstafayof

Fermandarekî kevin ê artêşa Sor ku dengyên herêmê û nasîyarê wî zêde bûn, yekser ev firsend bikar anî û wekî Serokê bizava azadiyê bi otobûsan, millet bire Laçînê û deklarasiyona Serxwebûna Kurdistana Qefqaziyayê eşkere kir û li 9-10 Hezîranê ev ji hemû cîhanê re dan zanîn. Ji wê demê virde ev deklarasyon li ser Kaxezê maye û tu hemelekî xwe jiyanî nine. Herwiha nezalalî jî di navbera Azerî û Ermeniyên de berdewam in û çî dibê bila bibe, lê du car avakirina Kurdistana Sor dîsa jî hêvî û bi xwe bawerbûnekê dide Kurdan. Komara Kurdistanê û Kurdistana Sor tîrojkek berbiçav û ronak a gelê kurd in.

Rojnama Agirî - Hejmar 105, 15'ê Şibata 2009

Pêşmergeyekî Herî Kevnar Yê Komara Kurdistanê Koça Dawiyê Kir

Mixabin roja îne, 6'ê Şibata 2009'an, **Ebdulqadir Debaxî**, naskirî bi **Mame Qale**, Pêşmergeyê herî kevnar yê Komara Kurdistanê û PDKÎ û herwiha endamê komeleya J-K, di temenê 88 saliyê de li bajarê Londonê çû ser dilovaniya xwe.

Mame Qale xebatkarekî mezin yê rêya serbestiya Kurdistanê, têkoşerekî mandînenas ê tevgera Kurdayetiyê û alîgirê wekheviya jin û û mêran bû. Wî nêzîk 70 salan li jiyana xwe di rêya azadiya Kurd û Kurdistanê de bihurand.

Nemir Mame Qale pirtûkek dewlemend li ser dîroka Komeleya Vejiyana Kurd nivîsiye ku çavkaniyek giring li ser J-K'ê tê hesabandin. Her wiha pirtûkek çîrokan

ya nivîskarê Navdar ên Îranî, Sadiq Hidayet kiriye Kurdî û her 2 hatine çapkirin. Çend destnivîsên wî bi cî mane ku çap nebûne. Sedan



gotar û lêkolînên wî di rojname û çapemeniyên tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê de hatine belavkirin.

Bi vê hencetê ve, Desteya Weşana Agirî, behî û sersaxiyê pêşkêşî endamên malbat û xizm û kesên wî nemirî û hemû xelkê Kurdistanê dike.

Rojnama Agirî - Hejmar 105, 15'ê Şibata 2009

**Bi Boneya Hatina Sersala Kurdî Ê Cejna Netewî "NEWROZ"
. Em Bi Navê Komîta Rêvebir Ya Belavoka Newrozê, Hemî
Gelên Cîhanê Ê Bi Taybetî Gelê Kurd Pîroz Dikin**

Endezyar Ebdîn Xelîl jî goç barkir

Îro jî Di 24-2-2009 an de, stêrkek geş, ji asîmanê gundê Berbenê herêma Efrînê vemirî û dilê bavê Rêzan rawestî.

Belê gelî hevalan: Mamoste Ebdîn ,di sala 1953 an li gundê Berbenê ji dayîk bû, fêrnama Endezyariyê sala 1981 an ji zanîngeha Helebê wergirt. Pişt re di navça çandî ya Efrînê de xebitî û ji ber ku di karê xwe yê rojane de ne qels û sist bû ew ji aliyê



hemû hevalê xwe yên kargehê ve, cihê rêzgirtinê bû û bêdudilî ta roja çavdamrandinê, di karê xwe de berdewam bû.

Heval Ebdîn bavê Rêzan, sala 1974 an derbasî nav tevgera Kurdî bûye, û di seranserî jiyana xwe ya rêxistinî de, bi gelek çalakiyên têvel beşdar bûbû û ta roja goçbarkirinê, di komîteya herêmê de dixebitî. Roja 25-2-2009 an, bi beşdariya hezaran dost û hevalan û li ser milê komikên folklorî, di goristana gundê Berbenê de, binax dibe. Hezar hezar dilovanî, li giyana bavê Rêzên be.

Li dawiyê em serê xwe û malbata wî xweş dikin .

*Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê
me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de*